

Nûçe û Çalaki

Nûçe û Çalak

Ji gerdenê stûyê dîrokê morikek wenda bû

Morika gerdenê stûyê dîrokê , stiranbêjê me yê mezin , Baqî Xidirê Hindawî ye . Baqî kî ye ? . Baqî kurê Xidirê Hindawî ye , sala (1913) an .z , li bajarê Kobaniyê ji dayik bû , di maleke koçer de perwerde bû , du jin anîn û ji herdu jinan (12) xort û (8) keç pêda bûn .

Keysetên wî : Baqî Xidir pir bi hêmin û aram bû , tu kes ji xwe nedêşand û ji tevan hez dikin , stiranbêjê gelê Kurd tev bû , dengê bilind û zelal li ser bû , û dengê wî ta bi (3) km an dûr diçû . Baqî ji meş û bazdanê , ta dawiya temenê xwe hez dikin .

Hunera Baqî Xidir : Wî ji / 16/ saliya xwe ve , dest bi stiranê kir . Stiranên wî yên navdayî , Dewrêşê Evdê , Xezal (Teyar , Ehmed Axayê Mendê) , ' Bêmal " û Xemê Zalim bûn . û ev stiranên jorîn , wî ji devê bavê xwe girtin . Hêjaye bê gotin , ku kebanîya Baqî ya biçûk " Edle Hemam " ew jî dengbêj , û ji maleke dengbêj bû jî . Wê ji Baqî re , hin stiran jî (mîna : Stirana Dilo û Xalo) saz kirine . Herweha kurê wî yê mezin Cemal jî weke bavê xwe distirê .

li 7/2/2009 an z , kat /6.15/ an , li Bajarê Helebê , li taxa Şêx Meqsûd , ev stiranbêjê hêja û giranbuha , piştî /96/ salan ji temenê xwe , û /80/ ê salî ji parastina stiran , kultûr û zimanê Kurdî , çavên xwe girtin û ji nav me barkir . Di wê rojê de , cendeka wî li otombîlê siwar dikin , meriv û hogirên wî pêre bi rê dikevin û dibine Kobaniya bixemgîn . Li ser çema Ferêt , dora /600/ otombîlî , û / 1000/ matorî , ji xelkê me yê Kobaniyê , kal , mêt,jin xort û keçan pêşewaziya wî dikirin . Hemî bi çoşeke mezin , girî , şîn û baxên gulên , bi tabûta Baqî re bi rê ketin , berê xwe dan Kobaniyê , di şar û kastînen bajêr re gerandin , ta ku ew û Kobaniya hêja xatirxastina dawiyê ji hev bixwazin . Paşê jî , li goristana bajêr , li nêzikî gundê " Termikê " , bi beşdariya cemawerekî mezin , baskên tevgera Kurdî û rewşenbîran hate veşartin .

Li dawiyê gelek gotinên hêja , di dermafê xeyset û xebatên wî de hatin pêşkêş kirin û bi xemgînî û çavên ziwa xelkê me yê bi rûmet

vegerîn mal . Û wan bi wê çoş û çalakiya xwe ya mezin nîşan dan , ku herkesê di ber gelê Kurd de bixebite , tu carî cefayê wî ji bîr nabe , û navê wî wê di hiş û dîrokê de bên kolandin .

" Bi navê komîta rêvebiriya Newrozê û xwendevanên wê , em serê gelê Kurd tev sax dikin û aramiyê ji xwediyar re hêvî dikin " .

Biravo Ehmed Tirk...pûnga we da hev , pîroz e*Beşîr Mele*

Bi mamostayetîk pir zirav û bedew,di demek pir nazik û girîng de we deng veda.Bi vê helwesta we ya ciwan a ku ji xwêdan û keda gelê Kurdistan ber û encam girtî ,we mask û perdeya xap û vîlilkên dagîrkeran ji ser riwên wan rakir. Di ber bangên van rojên bi taybet de ku serokwezîrê Tirk Teyib ardogan hewil dide carek dîtir gelê me bi şeweyekî dem lê buhurî bixapîne.Di heman deman de jî bersiva wan kesên xwedê giravî xwe zana û dûrbînên gelê Kurd dibînin, da .Di derbarê TRT6 de ewê bi şabaşî û xweşbînî helwesta Erdoganî şîrove dikir Ehmed Tirk vajî îsbatkir. Partiya civaka gel û rêvebiriya wê, bi vê helwesta gewre,asta xebata tevgera civaka gelê Kurdistan veguest qadek bilind û firehtir. Li 24 Sibatê weke erdhejînekê bû li bingeha perlemana Komara Tirkan ket,ya ku ji heştê salî de ji rojek wehare xwe amede dike ku neqewime.mîna mar ku ji pûngê çendî direve û jê ditirse ,ev pûnga ku tovê wê ji navbera du çeman resenî girtiye xwe dirêjî qulên marên kevnakirî dike di ode û kuşkên wande ye bixazin yan nexwazin.

Ehmed Tirk baq û gurzê vê pûnga deşt û zozana kurdistanê li gel beybûn û nêrgizên dehl û çîmenan netenê dide ber pozê perlemana Tirkan ,vêre jî dewlet û hêzên ku piştgirya Tirkan dikin di bînpêkirina mafê gelê Kura û pîrsa mirovatîyê de...

